# DINYA DELAL E

# Û KURTENIVÎSÊN DIN

# ÇEND GOTIN

Hin car bo vegotina ya di dilê xwe de mirov ne hewceyî nivîsîna pirtûk û romanan e. Hesta kûr dikare pirr kurt jî bêt derbirin.

Ev ceribandin di heyamê nêzîkî deh salên borî de hatine nivîsîn. Kurtenivîsên min yên bi vî awayî ne tenê ev in, lê gelek hê li ser defterên bi destî nivîsî mane. Hêvîdar im ku dem û derfet rê bidin ku carekê wan jî raguhêzim ser kompûterê û bo xwendevanên delal berdest bikim.

***Husein Muhammed***

*London, 2009*

# DINYAYA DELAL

Dinya tijî wîşiyên tirî ye, bi tacgulên beybûnan dagirtî ye, miştî kulîlkên sîs yên sosina ye. Mêrg bi gulên sor, zer û şîn pêlên şêt û şeyda didin.

Ma çi bêhn wek vê biharê xweş û pîroz e! Havîn me mest û mendehoş dike.

Bijî, bijî, bijî! Vê gava xurt ya jiyanê bi har û hêçî bijî! Pelên kulîlkên xwe bi temamî li ber rojê veke, Bila jiyana te pişkivîn be, meya av û tava jiyanê vexwe!

Madem ku carekê jiyana te pişkiviye, êdî ne xem e ku dê carekê mirin te bigire, ne derd e ku delaliya rengîn dê paşî biçilmise û biwere.

# KUJERÊN EVÎNÊ

Me biryar da ku em evîna xwe bihêlin, her yek ji min bi rêya xwe ve bimeşe, em hev ji bîr bikin.

Ax çi biryar şêt û şeydane bû! Ma şopa çeqê birrandî dê çawa ji darê winda bibe!

Bi ken û rûyên bêreng me sorgula evîna xwe perritand û kulîlkên wê yên sor û geş di bin piyên xwe ve perçiqandin.

Lê sorgul nemir. Hêza jiyana wê tirsnak bû. Perçiqandî jî her pelgê wê hê dilerizî û dibiriqî û çeqên wê yên qetandî jî nalînên xwe yên bêdeng digihandin ber perrên esmanan. Berfa nûbarî ji çipên xwîna wê sor bû û hilmek xwînawî hilda hewa.

Di nav wê hilma xwînawî re awirên me herduyan, du kujeran, bi hev ketin. Em herdu behecîn û me berê xwe ji hev bada.

## NE BAZ IM, NEY IM!

Ne şervanek alahilgir im, ne rêberek dilbaz im ku rêya spêdeyek nû nîşanî we bidim.

Rûlek li ber çemî me, bayên biyanî mêvanên min in.

Giyanê serhildêr davek min dipiçîne daku awazekê pê bistire, awazek tijî bahoz, jan û evîn û belkî piçek ronahiya spêdê jî.

# BI şEV LI NAV BAXÇÊ HAVÎNÊ

şev tarî û giran in, mêwe diweşin, diweşin. Ma gurmîna nav cinînan nabihîzî? Dinya wek daholek dêwane ye, di şeva şîntarî de hêdîka dilerize.

Bi mêweyan şevên havînê dişewitin, bi sêvan şevên sîs! Bacanên sor distrin: leşê me roj û tav e!

Cejna mêweyan e, ez mest kirime! Pûşiyê zeviyan agirek gurr û geş e. Ma gurmîna nav baxçeyan nabihîzî? Dinya wek daholek dêwane di şeva şîntarî de hêdîka dilerize.

# LI BENDA MIRINÊ

Dema ku zarok bûm, dema ku hevalê dinyaya delal, tava geş û darên hejok bûm.

ji te gelek ditirsîm mirinê.

Niha li beravê di nav rêvingan de bendewarî te me. Em bi çavên westiyayî li deryaya tarî dinerin ka kengî keştiya te dê bêt.

Em ti tiştê ji jiyanê zalimtir nanasin loma em bo rizgariyê li benda te ne, te ya ku em qet nas nakin. Dema ku îşaretê bidî me, em dê bi bêdengî bikevin keştiya te, bi hêviya qenciyê, delaliyê, belkî azadiyê yan ronahiyê.

# YAR Û HEYVA BEXTIYAR

Min şûnpiyên te di nav xîzî de dîtin û tacgula te çend kulîlk bo rêberiyê werandibûn ser rêya min.

Hemî rojê min ê reben ji dûr ve çavdêriya te dikir. Kenê te li gel hevalên te wek dilopên dilveker li min dibarî, destên yên qemirî sivik wek çivîkan tacgul li serê te vedihûnand.

Piştî ken û stiranên te yên li ber têhna tava nîvro êdî westiyayî, yar! Lê niha jî bihêle sîbera bijangên te li rûyê te yê zêrrîn bibînim!

Behr li beravê bêhna xwe vedide û dihêle ku heyv endamên leşê wê maç bike. Xwezî tu derya bûyayî, yar, û ez jî heyva bextiyar.

## PAYIZÊ LI BERAVÊ

Banê esmanî bi çiraya stêran geşkirî ye û dinya bêdeng e. Derya bi pêlên tarî li kevirên reş dide. Pelê dawîn yê dare wek destê yê dixeniqe yan gaziya yê lal min bêhnteng dike.

Zeriya daristanê perdaqa zîvîn ya heyvê bilind dike raserî gupikan û paşî wê diavêje ava reş û bi şingînî dişkîne. Êdî tenê dengvedana xemgîn li binê daran dikinkine.

# TU BEHR Î, EZ BERAV

Tu behr î, yar, ez berav im. Ji te nikarim birevim. Bi kerb û kîn û bêbextî di ser min re diborî beravên biyanî.

Bêhêvîtî bûbû mijek li raserî min, hêza dilê min vemirîbû, min nedizanî bi çi bijîm.

Lê paşî tu dîsa bi xurtî, bi çavên xeniqîner vegerî. Te piyên min maç kirin û stirayî: ”Tenê tu, yar!”

Bi hezaran caran min tu nefret kirî û bi hezaran caran dîsa li te borîm.

## ÊVAREK DELAL Û DERDGIRAN

Xetek zerî tarî di avê de diyar bû.

Goga rojê xwe veşart pişt çiya, kulîlkan devê xwe girt û dinyayê xwe vekêşa bêhnvedanê. Tarîgewrikek şîn û sor çavên min vemaçandin. Çend pelatînkên qedîfeyî mirin û daketin erdê.

Xetek zerî tarî di avê de diyar bû.

# DESTPÊKA JIYANA MIN

Wê êvarê hemî jiyan nivistibû û tava welatê rojê jî xwe vekêşabû bêhnvedanê.

Dema ku piştî jana mezin, li ber tavheyvê di himêza dayika xwe de min dest bi tamkirina meya jiyanê dikir, êdî pêtalên hingura êvarê jî meşîbûn pişt çiyayê Girbexşoyî.

Dayika min hem digirî û hem jî dibişirî lê min tenê hay ji bersîngê wê yê germ hebû û min serikên sor dimêtin. Wisa jiyanek delal û xemgîn bi dirûvê şîrê spî xwe berda leşê min ê hûrik.

Ti tirs jî nebû ku ew evîna germ ji min xilas bibe. Bersîngê dayika min jî kaniyek bêdawî bû wek dinyaya dayik ya ku niha jî bêhejmar takekesan têr dike.

Dilê min jî qet nedişewitî bi dayika min a delal ya ku bi xwîna xwe xwarin dida min. Wek her jiyana nûpişkivî, mafê min jî yê yezdanî hebû ku zalim û stemkar bim!

# GERDENÎKA ROJ Û şEVAN

Ez tenê lawikek reben im li ber çavên te yên germ yên ku awirên wî ji maç û himêzan jî agirbartir in. Min tenê dilê xwe yê derdgiran heye ku bidim te lê siya min mest bûye û li te digere.

Evîn min bêdeng dike dema ku li rûyê te dinerim, ey yezdana min. Dilê min wek sindoqa xezîneyan wê gerdenîkê diparêze ya ku her roj û şeva te dayî min pê ve hatine ristin.

Lê eger tu ji min biwestî û çavê xwe li min bigirî, ez dê wek stêrên spêdê bi bêdengî winda bibim.

## VEJÎNA JIYANÊ

Dilê min, yê wek pûşê şewitî mabû, bi carekê ji nişkê ve lerizî û recifî. Gulek sor û geş ji nav xweliya wî derket û bi jan pişkivî û bi zordarî dijî min erka vejîna jiyanê bi cih anî.

# YEZDAN DI NAV GULISTANA MIN DE

Diyar e ku bi şev Yezdan di nav baxçeyê min re boriye: hemî kulîlkên sor vebûne. Newêrim derkevim, ditirsim ku di nav çirîskên wan de bişewitim.

# DILÊ MIN DITEWE NAV GULISTANÊ

Dilê min diçeme nav gulistanê wek kulîlkên bi xunav li berpsêdeyan dema ku hê tav hilnehatiye.

## KULÎLKÊN GULA REş

şev wek gulek reş e û dilên li ber bişira mirinê  bizdayî kulîlkên wê ne. Kulîlk li ber kenê rûyê te direcifin.

Îşev dê erebeyên te yên wêran biajon ser kê? Jiyana kê dê vê şevê biperçiqînî? Hewara kê ya mirinê dê di vê şevê de wek gulek reş û mezin ya lerzok deng vede?

Êdî dua û lava li ser lêvên me nemane. Destên me yên bilindkirî ji mêj ve ye ku di bin çerxên erebeya te de hatine jêkirin.

# SEBR Û HEDANA şEVÊ

Gelî gulên min yên ku şeva germ bilind dibin û bi bêhna xwe derdora dagir dikin!

Dixwazim vê raza xwe li gel we parve bikim, ev raza ku bi roj ne diyar e lê bi şev min dilerizîne. Rûyê xwe didim ber rûyê we yê delal, yê tijî têhna jiyanê. Pê dihesim ku hûn milên min maç dikin û rûyê min bi şermê jê sor dibe.

Ma hûn hemî di vê şeva bêpêjn de dibişirin? Ez çavên we nabînin lê kenê we rûyê min jî vegirtiye.

Bi ken û girî xwe diavêjim himêza we ya bêhnxweş û maçikên kulîlkên we wek baranek hûr-hûr û hênikker li leşê min ê tagirtî dibare.

# HÊZA BÊÇEKIYÊ

Destên bêçek zordaran ditirsînin. Bênavbirr nobedarî bo zordaran pêwîst e. Li kolanan ji zarokan ditirsin, li gorristanan ji miriyan. Bê cerdevan û pasvanan newêrin derkevin.

Lê keleşên çekdar li kolanan digerin, li nav bajarî dimeşin. Ti kes bêçekan naparêzin, ti kes çavdêriya wan nake. Lê dîsa jî b_êçek natirsin.

## MA NAYÊ BÎRA TE

Ma nayê bîra te demaku jiyan tijî mucîze bû: ewr bilind dilivîn, çeqên daran hêdî dihejîn. Li ber stiranên firrindeyan te êvarê serê xwe datanî ser çokê min.

Ma nayê bîra te dema ku çav tijî şadiya stêran bûn: dinya bi raz û nehîniyan dagirtî bû, her sefer serpêkahtiyek nedîtî bû û li pişt keskesorê cîhana çîrokan dest pê dikir.

# MIN DIVÊ STIRANEKÊ BIBÊJIM

Min divê stiranekê bibêjim, stiranek sade û sivik wek axa nerm û gewrik. Dixwazim ku ew bîrîkirina bijan vebêje, behsa hesretek bêhêz û bindest bike. Bila awaza wê gurr û germ nebe û rengên wê çavan neçirisînin.

Min divê stiranek wisa bibêjim ku tarîtiya zivistanek dirêj bîne bîra mirovan. Dixwazim kilamekek ku demek bêpêjn û aram berçav bistrim, goraniyek ku çîroka heyamên berfê rêgirtî, mirov di xanîkê xwe ve, li ber bizotên sor û geş rûniştî bike. Bila awaza wê xewnan bînin xewa we.

# LI BERAVA MIRINÊ

Gelo ev berava mirinê ye? Av û ax û esmanan reştarî ne. Ne pêjnek tê, ne bêhnek. Peyvên te yên xopan wek xenceran dilê min perritandiye.

Bêhiş im, bêçare li asoya tarî ya esmanan dinerim. Gola heyva hilber lê belav dibe wek ku ji xwîna dilê min ê dirrandî peyda bûbe. Keştiyek reş ya bêdeng û tirsnak, bê ti ronahî, tê re derbas dibe.

# DU KEVOKÊN BIZDANDÎ

Wek du kevokên bizdandî û cemidî em li hev alizîbûn û ji tirsan vedilerizîn, bê hêvî me têhn ji hev digirt. Çeng û baskên me hatibûn kokirin, dinyayê em perçiqandibûn, xwedayan em ji bîr kiribûn, tenê stêrên sar şahidên me bûn.

# DESTPÊKA BIHARÊ

Ax li wan tîrojên bîranînan dema ku biharê karê hatina xwe dikir û te, tava xort û evîndar, ji şevê derketî û tîrên xwe yên agirbar avêtin kevana banê esmanî, dinya kir du guhanên têrker bo bişkojên biharê.

# ÊVAREK BÊPÊJN

Êvarek bêdeng e, nalîna hacîreşkan di ber sivandeyan re veçopiriye û tavê noqî pişt çiyayan kiriye. Tarîgewrîkek bêpêjn dîmenê derdoran di himêza xwe de fetisandiye.

Ji nav daristana tarî heyv wek gulek mezin ya matmayî hildikeve esmanî. Çima dinya wiha bêreng û mirî ye. Ka stiranên çemên mest, ka qîjewîja firrindeyên koçer?

## MIN VEJÎNE, DINYAYA DAYIK

Çi şadî ye ku li himêza te pal dim, dinyaya dayik, bi leşê xwe yê xort û taz, dev û difin di nav dewlemendiya te ya kesk de. Evîndarê te me, dinyaya dayik! Biharan dema ku şên dibî, havîna gava ku digihî, payizan çaxê ku dibeyî û zivistanan wextê ku rût dibî, evîndarê te me!

Min jî wek xwe xurt bike, min jî vejîne, bi coşa xwe hêza veafirandinek bêdawî bide min jî. Dema ku çavên min diwestin yan dilê min sar dibe, zengila bangê xwe lê bide, giyanê min bihejîne, zivistana dilê min bihelîne û min wek gulek biharê bi kulîlkan bixemilîne.

# MIN NEHÊLE

Bi kela xwe, bi tîrêjên gurrmijî di ser min re diborî û ava dibî pişt deryaya mezin ya ku lê biçûk û bi tenê me. Dilê min ji xeman direcife dema ku tu wisa min dihêlî. Binere çawa dilerizim, binere çawa destê xwe bi bal te ve dikim dema ku tîrêjên xwe ji min distînî û giyanê ji germaya xwe bêpar dikî.

Yezdana min! Dest biavêje van destên cemidî, min di ser vê seholbendê re rakeşe dilê xwe yê agirbar!

# BÎRA HAVÎNÊ DIKIM

Van şevên berpayizê, dema ku tarîtî wek deryayek reş bi pêlên xwe li derdoran dide, dema ku pelatînkên bizdayî di penceran re xwe diavêjin ber çirayan, van şevan rojên havînê tên bîra min. Giyanê min xwe dirêjî ber bi tavê ve dike wek darek ku diqerrise û bêçare li benda maçek germker im. Dilê min ê reben û behecî dibîne ku gul û giya li ber mirinê ne.

Ax, çima ez bi xwe jî li nav xîzê xweş, li ber deryaya şîn nemirim dema ku giyanê min li wan rojên kel û mestker yên havînê bi şadiyê çavên xwe girtibûn û xwe radestî germayê kiribû! Ez dê hingê ji te qet netirsama, mirinê, lê bila te ez ê rûken xort hingê rakiribûma! Bila ez neçar nebûma ku ku rûnim ber vê pencera reş ya ku ji min re tenê bêhna baranê û hewara kulîlkan tîne û çeng û baskên şewitî yên pelatînkên goyîn bi serê min de dibarîne.

# ROJEK SAYÎ YA PAYIZÊ

Erd, daristan û esman tijî delaliya bêhêvî ya payizê ne. Ken û axîna westiyayî ya axê hewa dagir kiriye, tava payizê ya sar geşiya xwe dide esmanan. Lekeyên tehl û xwînawî li nav pelgên keskî tarî dibiriqin û çend gulên derengmayî serê xwe yê şermîn ji erdê, ji nav pelgên behiyayî dertînin.

Esmanê ku havînê xwe şorr kiribû erdê, niha xwe hildaye bilindahiyên dûr û derdest. Rengê wî tarî bûye wek ku şevên havînê şîniya bêhejmar kulîlkan mêtibe. şevên havînê hemî, hemî bîskên têr û tijî, rojên pişkivî û geş û şevên şadîmaniyê hemî verevîne.

Li ber sayîtiya sar ya payizê bêhna sêvên gihiştî û sinbilên genimê dirûyayî diheje û kivarkên daristanan bi bêpêjnî diwerin.

## PAYIZA DERENG

Bersînga zeviyê hatiye mêtin ta ku vala bûye, erd reş û mirî ye, hêza demarên jiyanê rijiye, dinya ji hatiye bêparkirin. Nalînek kûr li esmanan digere û rondikên wî dibin robarên tarî li gir û geliyên ku hê kêlîkekê berî niha geş û guldar bûn. Çem û çiya behsa behiyan dikin û dol û derya bi çavên hêsirbar li karên kembax yên mirinê diheyirin.

Bêhnek pûtî ji daristanê tê û avzêl wek termên rizî ne. Li dor malên di xew de dengê çend pêngavên bi dizîkî û reyîna seyan e. Mirovên di malan ve di xewnên xwe de di bin nîrê tirs û xofek bêsalox de direcifin û digirîn.

Ji nav ewrên revok stêrek dadirije nav tarîtiya şevê.

# BERFA PÊşÎN

Li ber rengên giran û tarî yên payizê, min sîsî û spiyatî ji bîr kiribû. Lê spêdeyekê ew li min bû mêvan. Li dîmena dahatî mat mam. Patovek gir ya berfê bi rûyê min ve helî û dilê min hên kir. Aramiya derdorê wek şerbetê ket giyanê min.

Siriştê bi carekê rûpelê bi xwînê û zêrrî nexşandî yê payizê yê pirtûka xwe li ber min qulipand û pelek nû yê sîs li ber min vekir daku bi tîrojên tava nazik stiranên bi stêrkên patovên berfê lê nîgar bikim.

# ZIVISTANEK SAYÎ

Roj li dîmenê berfîn dide û her tiştî diteyisîne. Tav dibe bêhejmar pirtên birqok û derya û daristanan, çiya û çîmenan diçirisîne. Tava zivistanê li jêr esmanê hişk û sayî wek elmasek spî ye.

Dinya dîwanek yezdanî ye ku bi ramanek sar û sîs tê birêvebirin. Dîwanek yezdanî ya wan kesan e yên ku dilê wan jî wek elmasê sîs e. Mirovên wê jî hişk û sayî ne wek wê xwedayê ku navê ser rûyê dinyayê lê ji paş esmanên xwe yên dûr ve serweriyê dike.

Bizdayî li ber derî li wê peristgehê dinerim, hestên min pê diêşin. Direvim xanîkê xwe û li tava havînê digirîm, wê tava germ û wî xwedayê nerm yên ku şevên havînê datê nav gulistanên û bi maçên xwe bişkojan vedijîne û dike kulîlkên rengîn û bêhnxweş.

## MIN DIVÊ BIşEWITIM

Ez tenê agirek biçûk bûme, hêdîkan bi bêdengî li dûr çirisîne û bendewar bûme. Lê êdî jê ne memnûn im, Min divê hilteqim, bigurrmijim, bilind biqijqijim! Bila hema tenê şev û rojekê jî be!

Bila carekê canê min bibe agir, kela min hilfûre ber esmanan û gurzên min li dol û deştan daweşin! Eger paşî bibim xwelî jî, ne xem e!

Min divê bişewitim, bisujim, hêz û hinêra salan bi çavperkekê biavêjim! Bila tenê şev û rojekê be! Min nevê bi salan bi nîr û zincîran xwe rakeşim goristanê! Lavaya jiyanek aram û asûde nakim, bila bi tenê şev û rojekê peykelek agirî bim!

## HAWARA TALIYÊ

Devê xwe yê birsî veke û biqîrre! Ti tişt nemaye! Roj cara taliyê bi şermezarî ava bûye. Êdî erd şên nabe, av şêlî bûye. Ken miriye, rondikên dawiyê robarek miçiqî ne. Hemî telifîne. Tenê tu, tifalê taliyê û jiyana xwe ya vemir mane.

Lê dîsa jî hê tu heyî! Devê xwe yê birsî veke û biqîrre, bilûre! Vebêje janan wan hemiyan yên ku li berî te çûne, dilorîne kerba wan yên ku êdî nemane. Bistirîne hesreta wan yên ku hawara bêhevalan dikir û yên ku gorr û navê wan êdî nayê bibîranîn!

Bila dinyaya rûreş ji çerxa xwe dakeve, bila tav êdî hilneyê, bila herdu daweşin valageha bêtixûb! Belkî gaziya te bigihe yê Mezin yê ku em ji îrade û qudreta Wî hatibûn hebûnê!

Devê xwe yê birsî veke û biqîrre, hey gidî goyînê agirê jiyana vemirî! Bigihîne yê Nenas kerb û giriyê me yên ku gorr û navê wan êdî nayê bibîranîn!

## GULEK JI NAV XWELIYÊ

Dema ku destên min bêhêz bûbûn û min bi çavên qels li dinyayê rengbeyî temaşe dikir, min bihîst ku kesek gazî min dike. Ax çi jandar bû ku tixûbê nemanê vegerim jiyanê! Leşê min dilerizî û çavên min xwîn dirijî. Hestên min yên westiyayî bi zûrînek mestker şiyar bûn dema ku ronahiya jiyanê lê da.

Giyanê min yê ku wek zeviyek şewatê pûşkirî ketibû, veceniqî û vehejî. Ji nav xweliyê sorgulekê serê xwe rakir û bi jan vejî. Bi zilm û zordariyê jiyanê xwe dîsa vejîna xwe ya berdewam domand. Parçeyek canê min hê li sinorê nemanê bû lê xwînek zelal herrikî parçeya din û şadiyek bêtixûb dest bi sirûda pişkivînê kir.

## RÊWINDA ME

Wek zarokek li nav daristanek şevtarî, ez li vê dinyayê rêwinda digerim. Bêhejmar dengên hovane tên guhê min lê tê nagihim. Hema newêrim bigirîm jî.

## GUNDÊ MIN

Dema ku çavên xwe digirim, dema ku xemgîn û bi tenê me, tarîgewrikek warê min tine ber çavên min, gundê min li nav biharek nûşînbûyî.

Ew xewn û xeyal dergehê min e, tê re ji rastiyê direvim, xwe digihînim cihê ku tenê di xewn û xeyalaln de heye.

## TEVNPÎRKA BIÇÛK Û YA MEZIN

Li tevnpîrkek biçûk, ya bi lez dimeşe temaşe dikim. Heşt lingên sorî tarî leşê wê yê reş û zalim hildigirt. Wê tevnpîrka biçûk Tevnpîrka mezin anku Mirin anî bîra min, Mirina ku tevnê xwe li raserî hemî cîhanê raçaftiye û lingên wê ji xwîna miriyên jandar sorî tarî ye.

## DILÊ MIN LI ÇOLÊ YE

Dilê min li çolê ye, tenê roja ji paş çiyayan dertê ew dîtiye, tenê çavên karxezalan şahidên wî ne.

Li wê derê dilê min xurt lê dide, wek gulekê geş e. Xunavekê ketiye ser pelên dilê min û stêr tê re diteyisin.

## SPÊDEYEKÊ LI ÇOLÊ şIYAR DIBIM

Li bin beteniyê bi stêran nexşandî yê esmanî ketime xewê, li hewara rojê hilatime nav gulên bi xunavan reşandî.

Ji çiyayên asê çemek datê, pêlên bi bêhna çolê li ser leşê min govendê digirin.

# DIBIZDIM

Roj ava bûye. Direcifim, xew ji min vedireve. Dizanim ku gul li nav tarîtiyê jî geş im û şêr li derekê hewara xwe ya evînê bilind dike.

Wisa hest dikim ku dilek biyan di singê min de lê dide. Dibizdim û dibezim avek hênik li xwe bikim.

Her dar wek bilûrek dêwane awazên tirsnak dijenîne nav şevê.

## HILATINA HEYVÊ

Min gerdena xezalekê himêz kiriye. Em herdu li hilatina heyvê dinerim dema ku ji pişt çiyayên reş û bilind dertê.

Heyv wek xwendawendekê ya ku ji nav avê radibe. Ew ewrekê bo xwe dike dang. Li jêr hemî deştê xwe bêdeng kiriye.

Bilbilî tembûra xwe hildaye, awazên wê ber bi esmanan ve bilind dibin. Hemî stêr li cihê xwe rawestîne û guhdar in.

Li pêjna pêngavan şiyar bûm. Kesek li ber deriyê min rawestî bû, bêdeng li min dinerî. Agirê çavên şîn li min barî.

Min xwest birevim, xwe biavêjim nav tarîtiya kûr ya şevê berî ku hemî leşê min bişewite û bibe xwelî.

Lê wê devê xwe vekir û min xwe ber bi gotinên wê ve vekêşand. Min rûyê xwe lê veşart, wek darekê li ber daçemîm.

“Min tu li ser rêya derketina ji bajarî dîtî. Ji hingê ve dilê min dehbeyek tî û birçî ye. Tu tek kanî bûyî ya ku dilê min jê vedixwar. Hemî çol û çiyavan dengê stranan te vedida.”

## ROBARÊ LI HINDAVÎ KENDÊ

Robarek reşî boş, kelek biçûk li ser û mirov tê de. Tenê destên wî dibînim, wan xwe bi darî ve şidandiye, zer bûne û bêçare ne.

Robar dadirije kendekê. Esmanê li raserî bi çavek tirraneker lê dinere.

Xwedêyo, robar tijî kelek e! Yên nû bêdawî derdikevin. Di her yekê de mirovek heye. Kêm jê diqîrin, hinek hêdîka digirîn, bi pirranî dikenin.

Her kêlîkê yek jê dikeve.

## DEMA KU ZAROK Î

*Bi hilkefta bûna Rojbînê kurê min 16.7.2010*

Dema ku zarok î, tu dikarî bi per û baskên balindeyan bifirî, li ser gul û kulîlkan dadî.

Dema ku zarok î, tu dişê bi guliyên genimî ve hilkevî, li bêhna binefşan binivî.

Dema ku zarok î, tu ditiwanî li patovên berfê siwar bibî, li gel bayan bimeşî.

## TU HEMÎ DINYAYA MIN BÛYÎ

Li her dera dinyayê li gel min bûyî, dinyaya min bi te dagirtî bû.

Niha ji hemî dinyayê li te digerim lê te nabînim.

## RÊ JI HEV VEDIQETIN

Bi xatirê we! Rêya me ji hev vediqete. Yek dê li ber tavheyvê bimeşe, yê din dê di nav tarîtiyê re bibore. Yek dê rêya xwe ya bi tenê bibîne, yê dî dê li gel hevalan biçe.

Bi xatirê we! Yek bi hêviyan dagirtî ye, yê din rondikên bêdawî dibarîne. Yên din hema nizanin ka mesele çi ye dema ku behsa dawiyê tê kirin.

Bi xatirê we! Rê ji hev vediqetin, deng vediçopirin û dem şopan dimalin.

# EM JI HEV DÛR KETIN

Me ji hev hez kir: min ji te, te ji min. Lê sebeb ne ew bû.

Me hev êşand: min tu, te ez. Lê sebeb ne ew bû.

Sebebê belayê ev bû: tu ji min dûr ketî û te êdî tenê kêmasiyên min dîtin.

Tovê tûfanê ev bû: ez ji te dûr ketim û li hêjayiyên te girîm

# MIRÎ DI BINÊ BIRKÊ DE

Di binê avê de miriyek li ser piştê paldayî bû. Di bin qepaxên çavan re spîka çavan dibiriqî. Ew bi zalimî li min dibişirî. Min nikarî bilivim dema ku wî xwe bo pêhndanînê hilavêt.

Ez li ber mirinê bûm. Devê min bi bêdengî vebû. Di heman demê de çûçikek nesax ket ser rûyê min. Qîrrînek bitirs hat guhê min.

Ji tirsê reqbûyî min bi zorê xwe jê xilas kir. Yê mirî li binê birkê her dikenî.

## TU DÊ BIBÎ AX

Kesekî ez ji xewê şiyar kirim û destên wê yên sar zendên min zeft kirin. Kesek dîn bû.

Em di ber xaniyên xalî re derbas bûn û hatin ber eywanek mezin. Pencere vekirî bûn, tavheyvê şewqa xwe dida hindir û bêhna gilgileyê rizî hildifûrî.

“Hê ciwan î”, yê dîn got. “Haha tu dê bibî, axek reş û sar, hemî endamên leşê ted ê bibin ax, dest û tilên ted ê bibin ax, dev û lêvên ted ê bibin ax û nikarî maçan bidî û bigirî!”

Min dît ku tiştek diheje. Bi bi dijwarî xwe ji destê wî deranî û revîm… Bezîm û bezîm. Hewara min ya tirsdar ji xaniyên xalî deng vedida.

Dengê yê dîn ji guhê min xilas nedibû: ”Tu dê bimirî, bimirî, bimirî, bimirî!”

## LI ZIVISTANEK SAR

Ax, çendî xemgîn in rojên min! Li derve bayek sar tê. Dilê min li wir, li dûr, di nav darên rût de, ji min biyan û xerîb lê dide.

Demek dirêj di ser hingê re boriye dema ku dinya bi gulan dagirtî bû, tav gir û germ bû. Demek dirêj di ser hinge re derbas bûye dema ku min ji te hez dikir, dema ku min hê bîriya te dikir.

Niha êdî nizanim, her tişt êdî dûr e, her tişt bi perdeyek gewr û giran hatiye niximandin: evîn, kerb, jan û şadî. Tenê bi janek nenavkirî û tirsa mirinê dihesim, noqî avek kûr dibim.

BÎRÎKIRIN

Marek dirêj zîlika xwe avêtiye dilê min. Ax, ti reng li min nemaye! Tenê çend roj mane, tenê çend roj bo ku bimirim û êdî ti car nejîm!

Ax, çavên min çend tarî bûne! Di pencerê re li derve dinerim. Dengê zirrîna trênê ji dûr vet ê. Bi tenê me û marek mezin zîlika xwe avêtiye li dilê min daye.

Hewar nakim. Ma kî dê dengê min bibihîze!

# BERBIHAR

Çendî xweş e ku çavên xwe yên fêrî tarîbûnê bûyî vekim daku wek du kelekên biçûk yên bêehdan li berava dûr avjeniyê bikin.

ÇÎROK

Hebû nebû, dotmîrek hebû ku wek kulîlkek hûrik narîn û nazik bû. Jiyanê guh li hewara wê nedibû ji ber ku dengê wê kiz û nizm bû.

Dotmîrê dilê xwe ji singê xwe deranî û bow î axivî. Dilê wê wek tasek yaqûtê sor bû.

Dotmîr bêyî ku rojekê jî bijî mir. Lê dilê wê wek çirîskek agirî di ser çol _ciyayan re firî, gihişt Jiyanê û di destên wê yên zalim de şkest û bû çipên sor yên xwînê.

# XWEDAYÊ XEMGÎN

Xwedê ji esmanê xwe yê sîs daket, dada ser şaloka zirav ya heyvê û jê li dinyayê nerî, li wê goga teyisok, zeviyên kulîlkdar û darên ppişkivî temaşe kir. Wî dît ku çawa fêkî digihin, pelgên dibeyin û patovên berfê şopên jiyanê diniximînin.

Di nav wê siriştê de mirov peyda dibe, mezin dibe, digihe û dimire, dikene, digirî, dikîne û dievîne. Girî ji kenî zehftir û kîn ji vine mişetir bû.

Lê dîmenên dinyayê delal diyar bûn. Bêhnek mestker ji gulên di daristanên mezin de nepenî dihat. Karûbarên evînê yên nehênî dibûn sosinên neçilmisok û bêhna wan bilind dibû ber esmanan.

Xwedê ji halê xwe xemgîn bû, bi para xwe girî. Wî jî dixwest ku bibe tozek û xweliyek vê dinyayê û di girî, ken, geşbûn û mirina dinyayê de beşdar be.

## şEVEK şEYDA

Heyv wek keştiyek ronkirî derdikeve û dilive pêşberî min. Berî çendî çend salan tu bi xemgînî hatî nik min û te dilê min xwest.

Niha dilê min ê nazik di destê te de ye. Lê ax, destên te yên delal çendî zalim in! Destên xwe yên li nîv-mirî raberî heyva ku wek keştiyek ronkirî derdikeve û dilive dikim.

Te dilê min bir lê ji bîr kir ku yê xwe bo min bihêlî.